

KMR

# "Ez li qonaxa Piroseya Dublînê da me ewe bi çi wateyeke?"

B

**Zaniyarî ji bo daxwazkerên parastina navnetewî ku li qonaxa piroseya Dublînê da ne, li gor madeya 4 ji destorên (Yekîtiya Ewropa) bi jimareya 604/2013**


Ew belavoka zaniyariya ji were hatiye pêşkêş kirin ji ber ku we di vî welatî anku dî welatek dîke yê girêdayî bi peymana Dublînê ji bo wergirtina  parastina navnetewî  (penaberî) daxwaz pêşkêş kiriye û berpirsan lêre da hindek hecet hene ku li gor wan gengaze ku welatek dîke bersê lêkolîna daxwaza we be.

Yek ji zagonyên Yekîtiya Ewropa bi navê ‘zagonyên Dublîn piroseyek damezrandiye ku bi rêya vê em zelal diken ku kîjan dewlet berpirsê lêkolîna daxiwa we ye. Ji vê pêvajuyê re "piroseya Dublînê" dibêjin Mebesta ew belavokê  ewe ku pirsên herî zêde  liser ev piroseyê bersiv bidet.

Eger di vê belavokê da tiştek hatiye nivîsîn ku hûn tê nagahîjin, ji kerema xwe ji berpirsa biprisn.

Ev belavoka zanyarîyan tenê ji bo agadarîya we dê pêşkêş kirin. Em bi pêşkêş kirina ev belavokê dixwazin ku zanyaryên lser proseya Dublînê ji daxwazkerên parastina navnetewî re pêşkêş biken. Ev belavoke bi serê xwe çi maf û berpirsyarya yasayî çê nake /liber negerît. Maf û berpirsyariyên dewlet û şexsên bin proseya Dublînê li yasayên (Yekîtiya Ewropayê) 604/2013 da hatine tomar kirin.

©Yekîtiya Ewropayê 2014
Blavkirin bê kêşeye. Ji bo her çêşît bikaranîn yan çapkirina wêneyên şexsî, divê yekser ji xwedyê mafê bikavkirinê izin bê standin.




*Welatên Dublîn pêk tên ji 27 welatên endamên Yekîtiya Ewropayê (Hingarya (AT), Belcîka (BE), Bilxarya (BiG), Kirwatîya (HiR), Qibris (CiY), Komara çîkê (CiZ), Danîmarka (DiK), Estunya (ET), Fenlanda (FI), Fransa (FiR), Elmanya (DE), Yewnan (EL), Mecar (HU), Îrlenda (IE), Îtalya (IT), Letûnîya (LiV), Lîtwanîya (LiT), Lûksemborg (LU), Malt (MiT), Holenda (NiL), Polonya(PiL), Pirteqal (PiT), romanya (RO), silwakî (SiK), slûnî (SI), Spenî (ES), Swed (SE)) Venîs 4 welat "grêdayî" be yasayên Dublîn (Norwec (NO), Îslend (IS), Swîsre (CiH) û Lêxtinştan (LI)).*

## "Çima ez nav piroseya Dublînê da me?"

Zagonyên Dublîn li seranserê heremek cixrafî ku ji 31 welatan pêk dê, bicî divê. **Welatên Dublîn pêktên ji:** Hingariya , belcîka , bilxariya , kiriwatî , qibris , komara çîkê , danîmarka , estuniya , fenlanda , firansa , elmaniya , yewnan , mecaristan (îrlinda , îtaliya , letuniya , lîtiwaniya, luksemborg, malt, holenda , poloniya , pirteqal , romaniya , siliwakî , silûnî, sipaniya , sod winîs 4 welat "girêdayî" be zagonyên Dublîn (ne ruyc , ayisle nid , suîs û lêxtin şitan)

Piroseya Dublînê zelal diket ku çi welatek liser lêkolîna daxwaza we ya penaberiyê berpirseke . Bi gotnek dî, gengaze ku hûn ji vî welatî ji welatek dî re ku berpirsê lêkolîna daxwaza we ye bên vegohestin.

Piroseya Dublînê dû mebest hene:

- Piştirastikirna vê yekê ku daxwaza penaberiya we tê bigehîte destê rayedarê pêwendîdar ku berpirsê lêkolînê ;
- Misogerbûn liser vê îk ku we, bi mebesta berdewam kirna zina roniştina xwe di welatên Dublînê da, daxwazinameên cûda di çend welatan da ji bo wergirtina penaberî pêşkêş nekirne.

Heta dema ku zelal nebît ku çi welatek berpirse li ser lêkolîna daxwaz we, rayedarê lêre temaşayî naveroka daxwazinameya we naken.

**LI BÎRA WE DA BIMÎNÎT**: Ne pêdiviye ku hûn biçine welateke dî ku endamê Dublînê ye Eger hûn biçine welateke dî ku endamê Dublînê ye, dîsan tê we bizivrîne lêre yan cihê ku we pêştir livê da daxwaz penaberiyê pêşkêş kirbû. Paşveçûn ji daxwazê lêre da nabîte sedema vê yekê ku welatê berpiris li ser dûsiya we bêguhertin. Eger hûn xwe veşêrn anku pilên, gengaze ku hûn bêne destibser kirin.

Eger pêştir hûn di yek ji welatên Dublînê da bûne û di vê demê da pêş ku hûn bêne vî welatî we herema welatên Dublîn bicî hêlaye me agadar biken. Ew mijare giringe, jiber ku gengaze liser bijartina welatê berpiris liser lêkolîna daxwaza we, rolek serekî hebe. Gengaze ji we bê xwastin ku hecetên xwe ku nîşan bidet hûn demekê li deriweyê welatên Dublînê



©European Union

bûne, pêşkêş biken , bo mînak mohra liser paseporta we , belgeya biriyara zivrînê   yan derxistinê, yan belgeyên fermî ku nîşan didet we li deriweyê welatên Dublînê xebat yan jiyan kiriye .

## "Dibe ez piştirast bim ku çi agahî li destê berpirsan da hene?  Ez çawa dişêm ew agahiyane ji berpirsan re zelal bikem ?"

Gengaze hevpeyvînek gel we bê kirin heta ku em bişên li ser bijartina welatê ku berpiris bît liser lêkolîna daxwaz we biriyara xwe bigrin. Di nava ew hevpeyvînê da, emê piroseya Dublînê ji were zelal biken Dibe hûn hemî zaniyariyên li ser aknicî bûna her yek ji endamên malbata xwe di welatên Dublîn, û herwisa agahî ên dîke ku bi raya we gengaze peywendî bi bijartina welatê berpiris hebît ji me re rabgehînin (ji bo bidest anîna zaniyariya li ser agahiyên peywendîdar serdana jêr). Herwisa dibê ku hûn hemî dûsiye û belgeyên ku di navda agahiyên peywendîdar hatine tomar kirin, pêşkêş biken.

**Ji kerema xwe hemî agahiyên peywen dîdar ji mere pêşkêş biken heta ku arîkariya me bike bo bijartina welatî ku berpirsiyaretiya lêkolîna daxwazinameya we liser milê xwe bigre.**

Tê bi zimanê we anku bi zimanê ku hûn tê digehîjin û dişên gel xelkê peywendî bigirin tê pêk bê.

Eger hûn ji ezmanê ku dê bikaranîn tê nagahîjin, dişên daxwaza wergêrê devekî biken heta ku di peywendî girtinê da arîkarîya we bike.  Wergêrê devekî  dibe tinê gotinê we û hevpeyvînker werbigire. Wergêrê devekî nabît gotnê xwe ji gotnê were zêde biket. Eger hûn ji  ezmanê wergêrê devekî tê nagahîjin, divê me agadar biken / anku gel parêzerên xwe baxvin.

Ew hevpeyvîne tê nehînî bimîne. Bi gotnek dîke, çi agahiyên ku hûn pêşkêş diken, wekî daxwaza penaberîya we, ji xelk anku berpirsên welatê we ku gengaze bi her şêweyekê ji we anku endamê malbata we ku hêşta nav welat da ne, zirar bigehîne, nayêne pêşkêş kirin.

Paş ku piroseya Dublînê û encamên vê liser bardoxa we ji were hatine ragahandin, eger we pêştir agahî bi rêyek dîke pêşkêş kirbe, gengaze tinê mafî  hevpeyvînê ji we bête sitandin. Eger hevpeyvîna gel we neyête kirin, dişên ji bo pêşkêş kirna  agahiyên nivîskî yê zêdetir li ser bijartina welatê berpiris daxwazek  pêşkêş biken.

# "Berpiris çawa tê  diyarbiken ku kîjan dewlet  berpirse li ser lêkolîna  daxwaz min?" “

Hecetên coda liser berpiris bûna welatek li ser lêkolîna daxwaza we, hene. Ew hecetene bi rêjeya ku giringin û giringiya wan zagon diyar diket, têne sepandin. Eger hecetek peywendî çi nebît, tê heveta dî bête berçav û ew piroseya tê wisa berdewam be.

Hecetên peywendîdar bi fektorên jêr , bi rêjeya giringî yê:

- Yek ji endamên malbata we (jin yan şo, zaroyên temenê wî bin 18 salan da bît)  li welateke dî yê  Dublîn da parastina navnetewî  wergirtî ye anku penabere;
- **jiber vê eger yek ji endamên malbata we  li welateke dî yê  Dublîn da aknicî ye, divê pêş ku biriyar li ser daxwaza penaberiya we bête girtin, ji mere rabgehînin** . Eger hûn herû dixiwazin  di welatek da aknicî bin , divê hûn û endamê malbata we daxwaza xwe bi nivîskî rabgehînin.
- Pêştir yek ji welatên Dublîn ji were  vîze anku zina akinicî bûnê pêşkêş kiriye;
- Di yek ji welatên Dublîn da şona tiliyên we hatiye wergirtin (û şona tiliyên we di binkeya zaniyariyên ewropî bi navê  Eurodak da hatiye tomar kirin [1]);
- Agahiyên zêdetir li ser Eurodakê di ropela 8 a belavoka agahîyan da hatiye pêşkêş kirin "min li Yekîtiya Ewropa da daxwaza penaberiyê daye -  çi welatek tê li ser daxwaza penaberiya min lêkolên bike?




1) **Şahid li ser bûna we li , derbas bûna we li , welatek dî yê Dublînê hene, tevî ku livê da  şona tiliyên  we nehatbîte tomar kirin.**

## "Eger ez bin destê kesek dîke da bim anku kesek dî girêdayî min be, tê çi be?" “

Eger we hemî mercên jêr hebin , **dişên di welatê ku dayîk , bab, kor, bira anku xweşka we tê da aknicî ye** >biçne bal ewan:

- Ew akinciyê zagonî yê welatên Dublîn bin;
- Yek ji we dûgiyanî be, anku zaroke taze hatî yê we hebît, anku gelek naxuş bît, anku gelek seqet bît tan pîr bît .
- Yek ji we girêdayî be bi harîkariya kesek dî bît û ew jî bişêt kesê dî biparêzît.

Welatek ku zaro, xweşk û bira yan daybabê we livê da akencî ne divê bi asayî berpirsa lêkolîna daxwaz we qebûl biket, bi vî mercî ku we di welatê xwe da peywendiyê malbatî hebin. Herwisa tê ji we bê daxwaz kirin ku bi hevre daxwaza xwe bi nivîskî binvîsn û bi hevre bûnê qebûl biken.

Eger hûn niha li welatekê da ne ku zaro, xweşk û bira yan daybabê we livê da akencî ne, yan eger li welatekê da ne ku xizmên we livê da akencî nînin, dişên ew daxwazê biken Mijara dûyê bi vê wateyê ye ku divê hûn biçne vî welatî, xênjî ku rewşa saxlemiya we gelek nebaş bît û hûn nekarn demek dirêj sefer biken.

Xênjî ew gengazî, hertim hûn dişên ji bo gehîştin ji malbata xwe re bi hecetên mirovxazane, malbatî yan çandî daxwaz biden. Eger daxwaz we bête qebûl kirin, gengaze Hûn mecbor bin ku biçne welatek ku malbata we livê da akencî ne. Li vê demê da tê ji we bê xiwastin ku pejrandina xwe bi nivîskî rabgehînin. Dibe hûn hemî hecetên xwe yê mirovxazane ku divê di lêkolînê daxwaz we lêre yan li welatek dî da bêne bercav girtin ji mere pêşkêş biken.

**Li her demekê da ku peywendî, xizmatî yan mijarên mirovxazane derkevne holê, gengaze ji we bête xiwastin ku jih bo piştigiriya gotna xwe, ronkirnek anku belgeyek pêşkêş biken.**

## "Eger ez nexuş bim yan pêdiviyê min yê taybet hebin tê çi bibe? "

Lêre da ji bo ku berpiris bişên parastin o dermanên nijdarî yê kêrhatî ji er re pêşkêş biken, divê ji pêdiviyê we yê taybet, bi taybet rewşa saxlemiya we, agadar bin xasma eger we:

- Kesek seqet bin,
- Dûgiyanî bin,
- Gelek nexuş bin,
- Tûşî şikence, destidrêjiya siksî, yan tondotîjiyê dî yê deronî, leşeyî û siksî hatbin.

Eger hûn dûsiyeyê xwe yê nijdarî ji me re rabgehînin û biriyara veguheztin we ji welatek dîke re hatbe girtin, emê ji bo parvekirna agahîn we yê nijdarî gel  welatî ku hûn jê re tên veguhestin, zina we bixwazin. Eger hûn vê êkê qebûl neken, agahîn we yê nijdarî nayên şandin lê ew mijare nabe sedema paşketna veguhestina we bo welatê berpiris. Dibe ku hûn agadar bin ku eger hûn qebûl neken ku em agahîyên we yê nijdarî ji welatê dî re bişînin, ew welat neşê pêdiviyê we yê taybet çareser bike.

Ji kerema xwe agadar bin ku li gor pêdiviyê nehênî parastina agadariyan, pispor hertim agahîyên we yê saxlemê nehînî diparêzin.

## "Çi maweyek dikêşîne heta ku welatê berpiris liser lêkolîna daxwaza min diyar diket? "Çi maweyek dikêşîne heta ku daxwaza min tê lêkolîn kirin?"

Eger berpiris bigehîşne ew encamê ku berpirsiyaretiya biriyardan li ser daxwaz we ya penaberiyê bikewe ser milê me, hûn dişîn di vî welatî da bimînin û her lêre da daxwaz we tê bête lêkolîn kirin.

## "Eger berpirsiyaretiya biriyardan li ser daxwaz penaberiya min bikewe ser milê welat dî, xênjî welatê ku ej livê da me , tê çi biqewme?"

Eger em bigehîşne ew encamê ku, berpirsiyaretiya biriyardan li ser daxwaz penaberiya min bikeve ser milê welat dî, emê ji vî welatî dixwazin ku di navbera **3 heyvan** ji dema ku daxwaz we ji were tê pêşkêş kirin, berpirsiyaretiya lêkolînê qebûl biken.

Lê eger li gor zaniyariyên şona tiliyê we bête zelal kirin ku welatek dî berpirsiyare li ser lêkolîna daxwaz we, daxwaza pejirandina berpirsyarîyê li maweya **2 heyvan** ji dema ku encam ji Eurodakê tên wergirtin, ji welatek dî re tê şandin.

- *Eger bo cara êkê ye ku di welatên Dublînê da we daxwaza penaberî kirîye, li b hindek hecetan divê welatek dî yê Dublîn berpirsiyaretiya lêkolîn li ser daxwaz we li ser milê xwe bigrît, emê ji vî welatî dixwazin ku* ***" berpirsîya "*** *dûsîyeya we li ser milê xwe bigrît.*

Welatî ku daxwaz jê re dê şandin divê di navbera **2 heyvan** ji dema wergirtina daxwazê berisva vê biden. Eger ew welat li dema hatî diyarkirin da berisva xwe pêşkêş neket, ew bersiv nedane bi wate ya qebûl kirna berpirsiya daxwazinamê tê zanîn.

- *Eger we niha di welateka Dublînê xênjî welatê ku hûn lêvî dane, daxwaza penaberiyê kirbît, emê ji vî welatî dixwazin ku* ***"we bizivrînît"***

Welatî ku daxwaz jê re dê şandin divê di navbera **1 heyvê** ji dema wergirtina daxwazê, yan eger daxwaz li gor encamên Eurodakê derdikevtibît di navbera **2 heftan** da berisva me biden. Eger ew welat li dema hatî diyarkirin da berisva xwe pêşkêş neket, ew bersiv nedane bi wate ya qebûl kirna berpirsiya daxwazinamê tê te zanîn û nîşan dide ku ser zivrandana we rezamendî heye.

Lê belê eger we ji bo penaberê di vî welatî da daxwaz pêşkêş nekribe û encama daxwaza penaberîya we ya pêş bi biriyarek dawî hatbe retkirnem

dişên bi şandina daxwazek ji welatê berpiris dixwazin, ku we bizivrînît, yan pêdvê wegerandina we ji bo welatê we yê serkî anku akencî bûn di welatek ewle yê sêyem da pêk bîne .

Eger welatek dî berpirsiyaretiya lêkolîna daxwaz nameya we qebûl kir, emê we ji biriyara xwe agadar biken:

- ku daxwaza penaberiya we di lêre û di vî welatî da nayête lêkolînê û,
- emê we ji welatê berpiris re bişînin.

Şandina we di navbera 6 heyvan ji roja qebûl kirna berpirsiyê ji alê welatek dî we , yan eger hûn dixwazin ji vê biriyarê re gazinde bin, di navbera 6 heyvan ji dema ku dozgerî anku dadgehek navnetevî biriyara gengaz ya veguheztina we ji vî welatî re tomar biket, tê pêk bê. Eger lêre da hûn ji destê berpirsa birevin yan hatbine girtin, gengaze ku ew deme dirêjtir bît.

Eger hûn di vî welatî da wek pişkek ji piroseya Dublînê li girtîgee/ navendek girtî da bin, dema diyarbûîy tê ji were kurtitir be (ji bo bidest anîna agahiyên zêdetir bîştir, serdana pişka taybet ya girtiyan bike)

Welatê berpiris gel we wek penaberek tê kiriyar bike, û we hemî mavê peywendî dar tê hebe . Eger heta niha we di vî welatî da daxwaz penaberiyê nekiriye, ew derfete tê ji were bête pêşkêş kirin ku paş hatina xwe daxwaz xwe pêşkêş biken.

## "Eger ez biriyar veguheztina xwe ji welatê dî re  qebûl nekem, tê çi biqewime ?"

Hûn dişên nerazî bûna xwe dij bi veguheztina xwe ji welatek dî re rabgehînin. Ji vê kiriyarê re daxuza nêrîna dûbare yan" venêrîn" tê gotin. Herwisa hûn dişîn di maweya lêkolîna daxwaz nêrîna dûbare yan " venêrîn" xwe ji bo paşxistina veguheztina xwe daxwaz biden.

Ew belavoke di dawiyê da agahîyê berpiris peywendî dar ku divê bo daxwaz venêrînê serdan wan biken, pêşkêş dike.

Paş wergirtina biriyara fermî ya veguheztina xwe ji alê berpirsan we, 30 roja derfeta we heye ku bal dadgeha rêveberî daxwazeka venêrînê pêşkêş biken. Gelek giringe ku gazî (daxwaz nêrîna dûbare yan " venêrîn") we li dema hatî diyarkirî da bête pêşkêş kirin.

We (7) roja derfet heye ku ji bo paşxistina veguheztina xwe di maweya lêkolîna daxwaza venêrîna xwe daxwaz biden. Dozgerî di maweyek kirt da liser ew daxwazê tê biriyara bigrît. Eger paşxistin nehate pejrandin, hecetên vê tê ji we re bêne zelal kirin.

Li maweya vê piroseyê da, hûnê harîkariya zagonî û , eger pêdvî bît, arîkariya ezmanî werbigrin. Harîkariya zagonî bi vê wateyê ye ku we mafê hebûna parêzerek heye heta ku ew belgeyên we amade bike û di dadgehê da bi nûnertiya we biaxive.

Eger hûn neşên xercê parêzer biden, dişên ji bo wergirtina harîkariya zagonî ya bêlaş daxwaz biden. Agahiyên li ser rêkxistinn ku arîkariyên zagonî pêşkêş diken li dawiya vê belavokê da hatine.




©iStockphoto / Joe Gough

## "Gengaze ku ez bêm girtin? “

*Gengaze bi hecetên dî hûn bêne girtin, lê ji bo mebestên piroseya Dublînê, tinî li demekê da hûnê bêne girtin ku berpirsên me agadar bin ji ber ku hûn naxiwazin ji welatek dî yê Dublîn re bên veguheztin, bi texmîna zêde hûn dixwazin rabken.*

## "Ewe bi ç wateyekê ye? “

Eger berpirsên me agadar bin ku bi texmîna zêde hûn dixiwazin bazdin – bo mînak pêştir we ew kiriyare hebûye yan pêdiviyê raporê pêk nayinin û hitd – gengaze ku li her maweyek piroseya Dublînê hûn bêne girtin. Hecetên ku gengaze hûn li ser bêne girtin di zagonê da hatine tomar kirin. Bi xênjî hecetên ku di zagonyê da hatine, nabe kes bê girtin.

Mafê weye ku bi nivîskî ji sedema girtina xwe û gengaziya gazinde bûn li ser biriyara girtina xwe agadar bin. Herwisa eger hûn dixwazin li ser biriyara girtina xwe gazinde bin, dişên harîkariya zagonî werbigrin.

Eger li maweya piroseya Dublînê da hûn hatine girtin, çarçuweya dema piroseyê ji were tê bi rewşa jêr bibe:

- Hûnê ji welatê dî dixwazin ku di navber a **1 heyvê** ji roja pêşkêş kirna daxwazinameya xwe ya penaberiyê berpirsiyaretiya lêkolîna daxwaz we qebûl biken .
- Welatê ku daxwaz we jê re tê şandin, divê di navbera **2 hefta** ji wergirtina daxwazinameyê berisva vê bidet.
- Veguheztina we divê di navbera **6 hefta** ji dema pejrandina daxwazê ji alê welatê berpiris we pêk bêt. Eger hûn dixwazin ji vê biriyarê re gazinde bin, ew 6 hefte ji demekê tê bête hisab kirin ku dozgerî anku dadgehek navnetevî biriyarê digire ku veguheztina we li dema lêkolîna daxwaza venêrînê ji welatê berpiris re ji hêla ewlehiyê ji bo baştire.

Eger em nikarn derfetên diyarkirî ji bo şandin anku cî be cî kirna biriyara veguheztina we pêk bînin, girtina we ku bi mebesta veguhestina we û

li gor zagonên Dublînê pêk hatiye tê bidawî bibe. Li vê demê, sinorên zemanê yê asa ku li jor behsa wan hate kirin, tê bêne cî becî kirin.

## "Agahîn şexsî ku min pêşkêş kirine, tê çi lê bên? Çawa ez agadar bim ku ew agahî bi rewşa xirab nayên bikar anîn?"

Berpirsên welatên Dublîn dişên agahîyên ku we li maweya piroseya Dublînê da  pêşkêş kirne tinê ji bo pêkanîna berpirsiyariyên xwe li gor zagonyên Dublîn û Eurodakê gel hew dest bidest biken.  li maweya piroseya Dublînê ew mavê we ye ku  hemî agahî û zaniyarên we yê şexsî ku we liser xwe û malbata xwe û hitd pêşkêş kiriye, bêne parastin. Divê agahîyên we Tenê ji bo mebestên ku di yasayan da hatîye zelal kirin, bêne bikar anîn.

We tê mafê bikaranîna mijarên jêr hebît:

- Agahiyên li ser xwe. Hûn dişên ji bo agahiyên xwe bi taybet zaniyariyên Eurodakê li dema şaş bûna wan û paqijkirna wan li dema ku bi nazagonî hatbine ku kirin, daxwazekê pêşkêş biken;
- Agehî  liser çawanîya serrast kirin anku paqijkirna zanyarîyên xwe, bi taybet zaniyariyên Eurodakê. Ew agahîya ne pêk tên ji zaniyariyên peywendî gel berpirsên peywendîdar ko berpirsiyaretiya lêkolîn li ser  piroseya doblînê li ser milê wane,  zaniyariyên berpirsên netewî yê parastina agehiyan ko berpirsê bersiv dana daxiwazên taybet bi parastina agehên şexsî ne.

European Commission

euaa
EUROPEAN UNION
AGENCY FOR ASYLUM

Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

POLIISI
POLISEN I FINLAND
Police of Finland

Rajavartiolaitos
Gränsbevakningsväsendet
The Finnish Border Guard

5.2.2024 - kurmandzi